RESET
Training and Support

# Pispor li gorî cerebeyan: Cerebeya jiyanê û perwerdehiya li UKê ya Nour

Hevpeyvîna me ya bi Nour re bixwînin, ew behsa cerebeya xwe ya di temenê 16 salî de hatina UKê û hînbûna pergala dibistanan ya UKê dike.

Me bi xwendekarê bi malbata xwe re li UKê bi cih bûyî, ango bi Nour re hevpeyvîn kir. Di hevpeyvînê de Nour behsa cerebeya xwe ya hatina UKê ya hema beriya qedexeyên Covid-19ê, cudahiyên dibistanên UKê û yên Rojhilata Navîn û daxwazên xwe yên dahatûyê dike. Ji bo derbarê du salên wî yên pêşî yên li virê de zêdetir bizanî, li jêrê hevdîtina me pê re kirî bixwîne.

**Beriya du salan gava tu gihîştî UKê tu 16 salî bûyî. Gava tu hîn bûyî hûn ê li virê cîwar bibin, te çi hîs kir?**

Gava ji malbata min re ji ajansa penaberan ya NYê telefon hat û gotin malbata me ji bo cîwarbûnê hatiye diyarkirin, ez radizam. Saet 9ê sibê bû û wê rojê azmûna min a matematîkê hebû. Bavê min hat odeyê ku min şiyar bike. Wî got, 'Rabe, şiyar be! Em ê herin UKê!'

Min got qey ew henekan dike. Min got qey ew ji bo ku min şiyar bike da ez ji azmûna matematîkê re dereng nemînim wisa dibêje, lê ev rastî bû! Gava min fêm kir ew rastiyê dibêje, min pirsî 'Çiqas zû em dikarin herin?' Ez gelekî bi heyecan bûm. Mixaltiyên min li Amerîkayê cîwar bûne, min jî dixwest xwendina xwe bibim serî, loma ez gelekî kêfxweş bûm.

Ji bo hatina UKê tirs yan jî xemên min ên mezin tune bûn, lê hesteke ecêb e ku min hevalên xwe yên li Sûriyeyê û Urdunê li paş xwe dihiştin û diçûm welatekî din ê dûr. Li paş hiştina kesan tişta herî zehmet bû. Ji ber vê yekê hestên min ên têkel hene.

Gava em pêşî ji Sûriyeyê derketin, ez hê jî ciwan bûm - gelekî ciwan bûm ku bi tiştan ve bêm girêdan, ji dil. Lê gava ez ji Urdunê derketim, ez ji malbata xwe û hevalên xwe vediqetiyam, loma ev zehmet bû. Şikir, peywendiya min ya bi hevalên min ên li Sûriye û Urdunê re dewam dike û min karî peywendiya bi mamosteyê xwe re jî dewam bikim!

Gava hatim UKê herî zêde fêrbûna zimên û dewamkirina xwendinê heyecan dida min. Her wisa gelekî hêviya min hebû ku ez ê rojekê dikaribim mixaltiyên xwe yên li Amerîkayê bibînim. Ne xem e ka ew ê werin UKê yan ez ê herim Amerîkayê. Ez tenê dixwazim wan bibînim!

**Beriya tu werî vê derê derbarê vê derê de çi agahiyên te hebûn?**

Derbarê welêt de gelek agahiyên min ên diyar tune bûn. Min bi îngîlîzî jî baş nedizanî. Gava ez li Urdunê bûm, mamoste hin mijarên îngîlîzî yên bingehîn fêrî me kiribû – hejmar, rojên hefteyê – tiştên wisa. Lê min tenê ev dizanîn, yanî gava ez hatim virê, min digot ez zimên ji serî ve fêr dibim.

Her wisa, gava em li Urdunê fêrî îngîlîzî dibûn, îngîlîziya Amerîkayê û ya Brîtanyayê di nav hev de bû, loma gava min li UKê hin peyv digotin, xelkê digot 'na, ev bi amerîkanî ye!'

Ji tiştên ku min ji kesên din yên cîwarbûyî bihîstine, ez hîn bûm ku astengiya zimên dikare cîwarbûnê di destpêkê de zehmet bike, lê di nav demê de hêsan dibe. Tişta bûyî ev e. Di serî de zehmet bû, lê niha ez xwe wekî parçeyekî civakê dibînim.

**Tu dikarî dibistanên UKê û yên Urdunê çawa bidî ber hev?**

Dibistanên UKê û yên Urdunê bi temamî cuda ne. Beriya her tiştî, ziman cuda ye. Li Urdunê em her tiştî bi erebî fêr dibûn. Li virê em her tiştî bi îngîlîzî fêr dibin. Hin mijar li her du welatan ji hev cuda ne. Wekî mînak, ez ji dîrokê gelekî hez dikim. Li Urdunê em dîroka Urdunê û welatên erebî fêr dibûn. Lî li virê li UKê mirov mijarên bi temamî cuda fêr dibe. Ji ber ku mijar ji yên ez berê fêr bûme gelekî cudatir in, min biryar da ku dersên dîrokê nestînim. Ew ê wextekî gelekî dirêj bigirta heta ez hemû mijaran fêr bibûma. Lê dersên zanistê û matematîkê bêtir dişibin hev – tenê cudahiya zimên heye. Loma ji bo min hêsantir e ku bala xwe bidim ser zanist û matematîkê, ev veguhezbar in.

Şêwaza fêrkirinê jî li virê gelekî cuda ye. Wekî mînak, li dibistanên welatên erebî û li Urdunê, xwendekar bi piranî li sinifekê ne û mamosteyên cuda tên sinifan, lê li virê bi awayê din e. Cudahiya din jî azmûn in, li virê ji bo amadebûnê hefteyekê yan du hefteyan didin lê li Urdunê tenê çend rojan. Wekî din, dibistana min a li Urdunê tenê kur diçûnê, lê dibistana min a li virê têkel e.

Her wisa li virê zêdetir vebijarkên mirov hene ka dixwaze kîjan mijaran fêr bibe. Mirov dikare mijarên şexsî bineqîne û hilbijêre û ev ê di perwerdehiya zanîngehê de

bibin alîkar. Li piraniya welatên erebî bi piranî ku vebijark hene: beşa matematîk û zanistê, yan jî beşa wêjeyê. Modul li gorî van her du beşan in. Li Urdunê spartekên malê jî ji UKê zêdetir bûn.

**Tu demeke kurt beriya qedexeyên Covid-19ê hatî UKê. Pandemiyên bandoreke çawa li perwerdehiya te kir?**

Piştî ez gihîştim UKê, ez hefteyekê çûm dibistanê û paşê qedexeyên Covid-19ê dest pê kirin. Hefteya pêşî min baş fêm nekir, lê mamosteyan û şagirtan heta ji wan hat alîkariya min kir. Ji bo ku ez xwe îzolekirî hîs nekim tişta ji wan hat wan kir.

Paşê ji ber pandemiyê diviya ez li malê fêr bibim. Mamosteyan gelek lînk û pelên fêrbûnê yên cuda ji min re şandin ku di fêrbûna înglîzî de ji min re bibin alîkar. Ez her car bi mottoya ‘qet nebêje qet’ dijîm û ev min ji bo tişta dixwazim lê motîve bibim han dide.

Niha zimanê min çêtir e, lê hê jî ji min re pratîk divê. Bi riya dibistan û kolejê hin hevalên min yên brîtanî yên bi esilê xwe ereb çêbûn ku înglîziya wan gelekî baş e lê baş bi erebî nizanin. Me dest bi pevguherîna zimên kir – min ji bo erebî alîkariya wan kir wan ji bo înglîzî alîkariya min kir.

**Tu niha li kolejê yî. Tu li gava xwe ya pêştir difikirî?**

Erê, ez dixwazim herim zanîngehê. Heke ez hê jî li Urdunê bûma, şensê min ê çûna zanîngehê wê gelekî kêm bûya. Lê li virê pêkan e. Ez dixwazim muhendiziyê bixwînim, lê bavê min dixwaze ez bijîşkî yan dermangeriyê bixwînim... Dibe ku ez fikra xwe biguherînim. Min hê biryar nedaye!

Ji bo min ne giring e herim kîjan zanîngehê. Ez ê serî li pênc zanîngehên cuda bidim û kîjan jî min qebûl bike ez ê kêfxweş bibim. Lê ez tercîh dikim ku ez bi malbata xwe re bimînim û herim û werim, lê li nêzîkayiyan zanîngeh tune ne, loma divê ez dûr herim.

**Çima Sponsoriya Civakê giring e?**

Ez nikarim hestên xwe yên ji bo Sponsoriya Civakê bi temamî bibêjim ku wan em pêşwazî kirin, wan ji bo me gelek tişt kirin. Ez wisa difikirim ku vê bernameyê alîkarî da ku hêviya malbatên wekî malbata min çêbe û wan jiyana me gelekî hêsantir kir.

Ez ji ciyê xwe gelekî kêfxweş im. Ez parçeyeke civakê me. Ez niha her kesî nas dikim û ew min nas dikin. Gava ez li derve mirovan dibînim, ez silavê didim wan û ew jî silavê didin min.

**Koma Sponsoriya Civakê ku pêşwaziya we kir, niha xwe amade dike ku pêşwaziya malbateke didoyan bike, û malbata te bû dilxwaz ku ji bo cîwarbûnê ji wan re bibe alîkar. Ji bo nûciwanên vê malbatê çi şîretên te hene?**

Şîreta min ev e ku fêrî zimên bibin, lewre ev jiyanê hêsantir dike. Fêrbûna zimên di serî de gelekî zehmet e, loma giring e ku dev jê bernedin û bîhna xwe fireh bikin.